

Alîkariya aborî

– ji bo nexweşên pençeşêrê



Wêne: Adobe Stock

Hûn an jî kesek ji malbata we ya nêzik nexweşê pençeşêrê ne û aboriya we ya malê ketiye zorê? Civaka Pençeşêrê ya Norwecî dikare alîkariyeke yek carî ya bi qasî 3,000-20,000 NOK bide we an jî bide kesek ji malbata we ya nêzik eger hûn ketibin bin bandora pençeşêrê.

Serlêdana alîkariya aborî bikin eger pêwîstiya we bi wan hebe:

- Bexşek ku ji bo pirsgirêkên we yê aborî hêsaniyê çêbike
- Eger lêçûnên we zêde bûbe û/an jî dahatên we ji dest çûbe
- Eger xercaneyên we yê ku dewlet nade hebin
- Însiyatîfên rehabîltasyon an jî bêhnvedan/sihetê ji bo hemû malbata we (tedawiya li derveyî welêt guncav nîne)

Kî ji bo alîkariyê guncav e?

- Niştecihên Norwecê yên ku di sîstema tenduristiyê ya Norwecî tedawi-yê werdigirin.
- Meblaxên ji 3,000 NOKê ta 12,000 NOKê ji bo serlêdarên bêkar berdest in, her wisa meblaxên heya 20,000 NOK jî li gor hejmara mirovên malbata serlêdar berdest e.
- Rewşa aborî ya serlêdar ê bê nirxandin li gor meaşê mehane, xercaneyên malê, deyn û hebûnên li ser esasê budçeya pîvane ya ku ji hêla Lêkolîna Serfê ya Norwecê (SIFO) ya Zanîngeha Metropolitan a Oslo'yê hatiye amadekirin.

Çawa serî lê bidin?

- Roja dawî ya serlêdanê ya mehane 10ê her mehê ye
- Forma serlêdanê li ser kaxezê an jî bi awayekî elektronîk tijî bikin
- Serlêdanê bişînin www.kreftforeningen.no/tilbud li bin beşa alîkariya aborî ('økonomisk støtte' in Norwegian)

Wan belgeyên jêr jî wek pêveka serlêdanê bişînin:

- Meqbûz an jî daxuyanên dawî ku ji hêla NAV'ê ji bo hemû şexsên nav malê hatine derxistin
- Lêvegeranên bacê an jî nirxandina bacê ya dawî ya ji bo hemû şexsên nav malê yên 18 salî mezintir
- Belgeyeke tibî ya ku ji hêla pisporekî nexweşxaneyê an jî Bijîşkê Malbatê hatiye destnîşankirin, an jî kopîyeke belgeyeke din a ku teşxîsa nexweşiya we ya kanserê nîşan bide
- Penaber/penaxwaz divê hejmara D a Norwecê (hejmara nasnameyê ya demborî) û hesabê bankê ya Norwecî nîşan bidin

Eger pirsên we hebin, ji kerema xwe li ser hejmara +47 21 49 49 21 li me bigerin an jî ji me re eposteyekê bişînin navnîşana rettigheter@kreftforeningen.no.



KREFTFORENINGEN

Telefon: 21 49 49 21 • post@kreftforeningen.no • kreftforeningen.no